Technische Hochschule Georg Agricola

Belgegeha Zniyarîyan

Bernameya "Perspektive Aufstieg" (PPA) Semestera havînê SoSe 2027
Dema serîlêdanê: 23.11.2026 heta 22.01.2027

Bername ji sê Beşên sereke pêk tê:

1. **Gavên Ziman:** B2, C1

2. **Beşên Peywestekarî** (Glückauf!)

    - Semînerên cihêreng / atolye / gerên rênîşander (mînak atolyeya nivîsgehê, gerên rêberî li Muzexaneya (Bergbau) ya Alman û gelekên din).

3. **Beşên Teknîkî:**

    - ji B2: Beşdariya li hemî Wane / semîner / tutorial ji bo Xwendekarên birêk û pêk.
    - Ezmûnan binvîsin û Destkefteyên xwe bi xwe re bibin dema Xwendina Zanîngehê.

Têbînî:

- Tê payîn ku Kursên almanî di 29.03.2027 de dest pê bikin.
- Heftaneya dersan:
  B2: 15 saetên dersê, C1: 20 saetên dersê
- Demjimêr ji bo her kursê cûda ye. Hûn ê sê hefteyan berî destpêka Kursê li Astan werin belavkirin.
- Nîvîna Studicard/Teketê Almanyayê: her semestere heta 260 Euro.
  Dersên zimanê Almanî bêpere ne.
- Ji C1 de dibe, ku PPA Qelenê Ezmûnên Ziman yên fermî (DSH / Telc C1 Hochschule / TestDaF / C1 Goethe) seza bike.

Daxwazên ji bo mirov karibe beşdarî Bernamê bibe:

- Xwendekarên biyanî yên ku dixwazin bi statûya penaberiyê yan bê penaberiyê
- bixwîninBawernameya ketina Zanîngehê (Abitur) ji Welatê biyanî, ya ku li wêde ji ber Zanîngehê dêrandî be.
- Armanc ew be, ku tu li Zanîngeha Georg Agricola Xwendina xwe bidawî bike.
- Beşdarbûn li Ezmûna diyarkirina Astê elmanî ya PPA

Ez çawa karim xwe tomar bikim?

Niha ji kerema xwe gavên qeydkirinê bişopînin:

1. Ji kerema xwe belgeyên jêrîn bi forma PDF bi e-nameyê bişînin vê navnîşanê: Bewerbung-ppa@thga.de:

• Şehadetnameya dibistana seretayî (Abitur) bi zimanê orîjînal û wergerandina wê bi almanî an îngilîzî
• Destûra mayînê (rûyê pêş û paş) an jî nasname û heke hewce be vîza
• CV-ya nû (jiyanname) bi navnîşana niha û jimareya mobîl
• Heke hebe: belgeyên xwendinê (lîsteya notan, şehadetnameya zanîngehê) bi zimanê orîjînal û wergerandina wê bi almanî an îngilîzî
• Heke hebe: belgeya zimanê ji dawî kursa almanî ya bi serkeftin qediyayî

2. Em ê belgeyên we kontrol bikin.
3. Heke belgeyên we temam bin û şertan pêk bînin, em ê ji we re demek ji bo şêwirmendiya online bişînin.
4. Piştî qeydkirina we, hûn ê werin vexwendin bo testek tayînkirina asta zimanê almanî online. Ev test asta zimanê ku hûn dikarin di bernameya me de beşdar bibin diyar dike.
5. Piştî ku hûn encama testa tayînkirinê bistînin, hûn dikarin biryar bidin ka hûn dixwazin cihê di bernameyê de qebûl bikin an na.

Heger Pirsên we hebin, ji kerema xwe bi riya Telîfonê yan jî E-mail re Têkiliyê bi me re bikin.

Programm „Perspektive Aufstieg“ (PPA)
Isra Struzyna
E-Mail: Bewerbung-ppa@thga.de
Tel.: 0234/968-3215